**CÎHANA SEWDASER**

# HEYA HÎTLÊR JÎ DÊ JI KIRÊN ERDOXAN TIMA BIMA!

*... U t'a îro jî, wek wan pêşîyên xwe,*
*Ew dijminê me dîsa maye ew,*
*Ger lê pêwîst be, me dighîne xwe,*
*Lê-k hema dem tê, me zol dike ew!..*
*(Ji poêm a "Dojeh")*

**Ezîz ê Cewo**

Heya ku mirovahî bigihîje asta pêşvaçûna xwe ya îroyîn, r'êyeke dûr û dirêj derbaz bûye – ji merivxurîyê, t'evkujîyan, k'aranîna ç'ekên k'îmyewî û nûklerî û têr'ora dewletê a derûnî û bi ç'ekan.

Li ser vê r'êya hevxurîyê û barbarîyê mirovahî di gelek waran da pêşk'etin jî destanîne, heya di warê çand û hunerê, zanist û têknolojîyê da gihîştye destanînên nebînayî û bêhemp'a, lê dîsa jî mirov wek xwe maye: ewî ev destk'evtîyana dîsa kirine xizmeta k'arên xwe yên k'irêt… Mirov dem bi dem k'arên pêşîyên xwe yên serdema hovîtîyê û barbarîyîyê bi zanistî û teknolojî xurttir kirye: em hema k'aranîna ç'eka nûklerî ya li hember bajarên Japonîayê yên Hêrosîma û Nagasakîyê û ç'eka k'îmyewî jî – li hember bajarê K'urdistanê yê Helebçeyê bîr bînin…

Dibe ku di nava hinek xwendevanan da pirs r'û bide, k'a ev hemû çi têk'ilîya xwe bi r'ewşa gelê k'urd a îroyîn r'a heye?

Û, eger mirov wisa bi sivikayî li pirsê binihêr'e, dibe jî, ku wisa bê xuyan! Lêbelê, her tişt di dîrokê da bi hev va girêdayî ye, bûyerên îro, yên ku li hember gelê k'urd pêk tên, dumahîka heşmendî ya bûyerên dîrokî ye di r'ojên me da…

Bala xwe bidinê, ez di întêrnêtê da li bûyerên k'aranîn ç'eka k'îmyevî di cîhanê da ger'yam û r'astîî çenda agahîyên di wê derbarê da hatim. Yek ji wana, sernivîsa wê weha bû: "Gewretirîn bûyerên k'aranîna ç'eka k'îmyewî di dîrokê da". Û, hûn dizanin di vê gotarê da (û di yên dinê da jî) di derbarê r'êzek byerên k'aranîna ç'eka k'îmyewî da tê gotin, heya di hinek bûyeran da derdorê 20 mirovî hatine kuştin, lê di derbarê t'evkujîya Helebçeyê û 5000-an zêdetir cangorîyên wê da heya gotinek jî nîne...Jixwe di derbarê wan t'evkujîyan da, yên ku r'êjîma (û hemû r'êjîmên!) faşîst ên T'irkîyayê li hember gelê k'urd pêk anîne û îro jî tînin – hîç gotinek!

Çima?

Ez bersîva vê pirsê hêvîya wan mirovan dihêlim, ên ku xwe xwedî heşmendî û wijdan dihejmêrin!

Ya dinê, dîsa bala xwe bidinê, hersal demên cuda cangorîyên t'evkujîya gelan a di Împêratorîya Osmanî da, an di xolokosta cihûdan da bîr tînin (û herdem – ez jî bi wan r'a!), lê kesek behsa bi sedhezaran (dibe ku heya bi mîllîonan) k'urdên xrîstîan nake, yên ku dema wan t'evkujîyan di bin navên ermenîyan an asorîyan da cangorî bûne, kesek di derbarê wan k'urdên medenî yên misulman da bîr nayne, yên ku wisa jî di wan p'evçûnan da hatine t'unekirin...

Û hema îro jî, li ber ç'avê cîhanê, di T'irkîya faşîst da t'evkujîya k'urdan didome, û ev t'evkujî jî ji k'aranîna ç'ekên k'îmyewî û nûklerî xeternaktir e. Belê, îro bi girseyî li hember gelê k'urd ç'ekên k'îmyewî yan ên nûklerî nayên k'aranîn, lê ew têr'ora dewletê ya derûnî û bi ç'ekên cuda, ku li hember k'urdan tê meşandin, ji wan ç'ekên navborî xetertir e: r'êber û r'ayedarên siyasî yên gelê k'urd, yên ku behsa mafên mirovî û net'ewî yên gelê xwe dikin, tên hebskirin, û gunehên wisa li wan tê bir'în, ku t'evahîya jîyana wan ji bo wê t'êrê nake. Ma êdî t'evkujî çawa dibe? – Net'eweke bêserî dikin, û nivşên wê yên nû jî wek xwe p'erwerde û kedî dikin!

Lê ji milekî dinê va di bin navê ewlek'arîya dewletê da (dewleta faşîst – û ewlekarî?!) ew li hember şervanên azadîyê ç'ekên k'îmyewî k'artînin, û cîhan jî li hember van hemûyan bêdeng e!

Çma? – Ji ber ku hemû bi hev va girêdayî ne?!

Ev sûc, ê ku îro di K'omara T'irkîyayê da pêk tê, ne ku t'enê li hember gelê k'urd e, lê li hember t'evahîya mirovahîyê ye! R'êjîma faşîst a hevp'ar a Erdoxan û Baxçelî bi van kirên xwe vekirî t'fûyî wijdan, namûs û r'uh û r'ewanê mirovahîyê dike...

Hemma, mirovahî bêdeng e, r'asttir dibû, mirov bigota, ên ku ji navê gelan nûnerîya r'êvebirîya dewletan dikin, mirovên konkrênt in, ên ku li her tiştî anegorî berjewendîyên xwe yên kesî dinihêr'in û anegorî wê jî helwesta xwe dyar dikin...



Dema "Pêvajoya ç'areserîyê", di girtîgeha girava Îmralîyê da: parlamênter P'ervîn Bûldan û hevserokê HDP-ê Saleheddîn Demirt'aş hatine – bi Abdullah Ocalan r'a mijarê govtûgo dikin...

Û, sûcê herî mezin, ê ku li hember gelê k'urd pêk hatye, ew bi korsanî girtina r'êberê net'ewî Abdullah Ocalan bûye ji hêla hêzên navdewletî va, yên ku paşê ew r'adestî r'êjîma K'T' a faşîst kirine. Bi vê yekê wana xwest r'ayê net'ewî yê gelê k'urd hebis bikin, şûna ku klîka faşîst a Erdoxan//Bxçelî û hemû peya û xulamokên wan di dadgeheke navnet'ewî ya wek Dadgeha Nyûrnbêrgê da darizîni (wek ku di dema xwe da r'êvebir û r'ayedarên Almanîya faşîst hatin darizandin!), berovajî vê, K'T' hê jî bi fermî endema bloka NATO ye, heya hêvîya xwe winda nekirye, ku dê bibe endema Yekîtîya Ewropayê jî... Erdoxan di nava serokdewletên wan sazîyên navnet'ewî da t'evdigere, bi wan r'a t'evayî bir'yaran digire, bi aktîvî beşdarî pêkanîna hemû k'arên wan dibe, heya papayê Romayê jî di dema xwe da ew p'ejirandye û dua lê kirye, di Rêxistina Net'ewên Yekbûyî da jî ew beşdarî zîreveyên bilind dibe û ji wir p'eyaman dide cîhanê...

Mirov vê çawa nav bike?

De îjar were, û neqîr'e...!

Cîhan sewdaser bûye?

Hemû sazîyên navnet'ewî bûne t'erefdarên faşîzmê?

Û li ber ç'avê vê cîhanê îro jî r'êjîma faşîst a Erdoxan//Baxçelî vekirî, bê tirs û şerm di bin navê "Doza Kobanîyê" da li dijî siyasetmederên k'urd meşeke t'evkujîya siyasî pêk tîne.



Saleheddîn Demirt'aş

Û akorda dawîyê ya vê têr'ora dewletê û bêdadîya hember gelê k'urd jî bir'yara dadgeha dewleta faşîst bû (ma di dewletek a faşîst da dadgeh dikarin ne faşîst bin?!). Anegorî wê ji bo r'ayedarên siyasî yên gelê k'urd gunehê girtina salên dirêj hatye dayîn: ji bo Saleheddîn Demirt'aş – 42 sal, ji bo Fîgen Yûksekdaxê –30 sal û ji bo Ahmed T'ûrk–10 sal...

Li vira pirs dertê holê, gelo, bêyî erêkirina sazîyên navnet'ewî, yên ku T'irkîya Faşîst endema wan e, dadgeha K'T' dikaribû bir'yareke weha bida?

Ji hêla dinê va, dema mirov li dîrokê dinihêr'e, tiştekî balk'êş dertê holê: di dema xwe da, dema eşîrên t'irk û sêlcûkan li ser pişta deveyan hatin herêmê û Vîzans dager

kirin, şaristanîya wê împêratorîya gewre ya hezarê salan serobin û t'une kirin, heya dêra navendî ya cîhana xrîstîan – Aya Sofya werguhêr'î mizgevtê kirin, Ewropa şaristanî çi kir? Em vê jî ji bo dîrokê bihêlin! Lê dema T'irkîya îroyîn li ber ç'avê cîhanê, r'oj di nava r'ojê da Qibris dager kir, û K'omara t'irk a bakûrê Qibrisê "damezirand" û bi fermî ew nas kir, NATO-yê, heman Ewropayê û Dewletê Yekgirtî yê Amêrîkayê çi kirin?

Ev pirs jî hr'êtorîk e, bersîva wê di wê bi xwe da heye!


Fîgen Yûksekdax

Naha em bên ser pirsa "Doza Kobanîyê"!

Dema mirov gotina "Doza Kobanîyê" dibihê, ya ku tê ber heşê mirov ew e, ku divê di derbarê lehengî û berxwedana Kobanîyê da bê gotin, divê piştgirîya wê dozê bê kirin, divê DAÎŞ di wê dozê da bê darizandin ...

Lêbelê, di vê cîhana me ya sewdaser da her tişt hatye berovajî û serobin kirin, îro – r'oj di nava r'ojê da kevneşopîyên faşîzmê û îslama siyasî ya r'adîkal ji bo têk'oşîna siayasî di navbera dewletên cuda da bûne r'êgezên sereke. Îro bi wan hêzên bermayên dîroka mirovahîyê – dewlet û r'êxistin tolê ji hev hiltînin.

Hema, anegorî wan r'êgezan jî, r'êjîma Erdoxan//Baxçelî vekirî piştgirîya DAÎŞ-ê dike û îro tola têkçûna wê ji k'urdan hiltîne... Û ev tê têgihîştin, yekîtîya îslama AKP a Erdoxan û faşîzma Dewlet Baxçelî armancên xwe yên siyasî di jîyanê da dikarin her bi r'êya DAÎŞ-ê pêk bînin. Lewra jî hema di destpêkê da, dema di cîhanê da li dijî DAÎŞ-ê koalîtsîonek pêk dihat, ev dûêta AKP//MHP hemû hêz û derfetên xwe kir k'ar, ku nehêle DAÎŞ têk her'e, ku wê li ser, p'êyan bihêle. Ji hêlekê va hêzên k'urdan (HPG//YPG) û koalîtsîona navdewletî li dijî DAÎŞ-ê şer' dikirin, ji hêla dinê va hêzên art'êşa t'irk êrîş danîn, ser hezên k'urdan, ên ku bi lehengî li dijî DAÎŞ-ê ditêk'oşîyan. Ev jî ne bes bû, Tirkîyayê li ber ç'avê Yekîtîya hevpeymanî ya navdewletî ya dijî DAÎŞ-ê enîyek li dijî k'urdan vekir, û Efrîn dager kir...


Ahned T'ûrk

Li vira dîsa pirs dertê holê, k'a, gelo T'irkîyayê bêyî erêkirina Hêzên hevpeymanî dê biwêribûya tiştekî wisa pêk banya? Wê demê ev çi dur'ûtî ye? Wê demê hêzên hevpeymanî, wek ku li dijî DAÎŞ-ê r'adiwestyan, divê heman helwest li dijî T'irkêyayê jî dyar bikirana! Eger ne wisan e, wê demê ew divê vekirî bibêjin, k'a hevpeymanîyên k'ê ne – ên DAÎŞ//T'irkîyayê ne, an ên têk'oşîna li dijî DAÎŞ-ê?!

Em vê pirsê jî hêvîya wan cêntlmênan bihêlin.

Û pirsa dinê jî – ya darizandina ç'ekdarên DAÎŞî ye!

Heya naha k'urd hewar û hêwarzeyê datînin, dibêjin, divê pirsa darizandinek a navnet'ewî ya çe'kdarên DAÎŞ-ê pêk bînin, û cîhan jî vê dixwaze, lêbelê Hêzên hevpeyman vê pêk naynin – çima?

Ev girseya van ç'ekdaran di êwirgehên cuda da tê p'arastin û, yên ku parastina wan pêk tînin jî, k'urd in.

Dewletên gewre çima dadgehek a navnet'ewî ji bo daîşîyan amade nakin? Ew ji çi ditirsin? Dê hevk'arîya wan û DAÎŞîyan derê holê? Lê, eger tirseke wan heye, ku di wê dadgehê da dê hevk'arîya K'T'-a endama NATOyê bi DAÎŞ-ê r'a dê derê holê, bila hîç netirsin, ji xwe di derbarê hevk'arîya Erdoxan û r'êjîma wî ya bi DAÎŞ-ê r'a her kes

dizane, di wê derbarê da bi dehan nirxandin û şiroveyên mezin bi belgeyan va hatine weşandin, heya belgefîlm jî hene!– Dê ji k’ê veşêrin?

An dawîbûna vê t’evlîhevîyê nayê hesabê wan?

Û îro jî li ber ç’avê vê cîhanê, ya ku xwe şaristanî dihejmêre, ev bêdadîya hanê pêk tê – dewleta hevpeymanîya DAÎŞ-ê, a ku serokê wê wisa jî emîrê wê r’êxistina têr’ora navnet’ewî yê ne formal tê dîtin, wan sûcdar dike, yên ku piştgirîya têk’oşîna li dijî DAÎŞ-ê kirine, û dewletên endamên Hevpeymanîya dijî DAÎŞ-ê jî bêdeng in. Çima? Çi ye, her çiqas bi şêwazî li dijî DAÎŞ-ê ne, lê di r’astîya xwe da ew bi wê û T’irkîya hevp’ara wê r’a ne?

An ewana nikarin xwe ji wan derewên hinartî r’izgar bikin, ên ku di dema xwe da R’êjîma faşîst a K’T’ di derbarê T’avgera Net’ewî ya Gelê K’urd da wek r’astî wan daye p’ejirandin, û ew îro bi derûnî di nava xwe da hêzekê nabînin, hildin û navê wê ji lîsteya xwe ya “têr’orê” derxin, ji ber ku di dema xwe da wan bi daxweza T’irkîya endama NATOyê û hevk’ar û hevalbenda DAÎŞ-ê li wê zêde kiribûne?... Çawa dibe?

Ma ne, îro li ber ç’avê t’evahîya cîhana şaristanî r’ewşek derk’etye holê, ya ku r’astîyê û her t’enê r’astîyê ji wan r’a dibêje:

– T’evgera R’izgarîxwaz a Gelê K’urd r’êxistineke dijî têr’orê ye (antîtêr’or), ew di destpêkê da heya îro li dijî têr’ora dewletê ya K’T’ ditêk’oşe! – Û, eger mirov evê yekê nebîne, divê yan heşkor be, yan bêwijdan be, yan jî heval û hevk’arê sûck’aran be û anegorî wê jî di dîrokê da bimîne!

Ji vir û pêva êdî mirov çi bibêje!?

Di cîhanê da êdî jizûva têgihîştine, ku Erdoxan, her çiqas ew ne t’irk be jî, serokdewletê wê k’omara zulmê ye, û ewê anegorî exlaq, wijdan û r’êgezên xwe û wê dewletê t’evbigere. Ku dewletên gewre jî, dê ji hêlekê va xwe bidin xuyan ku li dijî DAÎŞ-ê ne, ji bo ku hineke dinê r’êvebirya têk’oşîna dijî wê hilnedin destê xwe, lê ji hla dinê va dê bi bêdengîya xwe ya ji Erdoxanê xwe r’a nebin asteng, ku ew k’arê xwe yê r’eş pêk bîne... Ji ber ku di herêmê da çiqas t’evlihevî û bêaramî hebin, ji bo wan ewqasî baş e, dê hert’im sedem hebin, ji bo ku ew destê xwe bikin nava k’arên wan...

Ev – ji bo sedemên derva yên bêdadîya li hember gelê k’urd!

Em naha veger’in ser sedemên hindur’în.

Li ber çavan e, ya ku hinek hêzên k’urd, bi t’aybet jî PDK û mala Barzanî, li dijî gelê me pêk tîni, di serê mirovê t’endyrust û li ser heşê xwe da cîh nabe.

Her çiqas ev êdî sîh salî zêdetir e, Başûrê K’urdistanê nîv-serbixwe ye, lê ji ber fenên (întrîka) navxweyî ew herêm wisa jî nebûye yek. Hê jî di navbera Soran û Behdînan da sînorê bi kontrola paseportan heye, heya di dema xwe da “sînorp’arêzên” PDK-ê (bixwîne – yên mala Barzabî) destûr nedane serokê Parlamêntoya herêmê, ku ew her’e Hewlêrê – ser k’arê xwe. Heya naha jî di Herêma otonom da hêzên leşkerî yên yekgirtî nînin – her beşekî wê (Behdînan û Soran) pêşmergeyên xwe hene! Ji xwe çawa di bin navê r’êfêrêndûma “serxwebûnê” da nîvekî Herêmê jî – bi bajarê K’erkûkê va ji Bexdayê r’a hîşçtin, tê zanîn (di vê derbarê da xudanê van r’êzan di dema xwe da pirsên bi r’êfêrêndûmê r’a p’êwendîdar nirxandine: “ Xweserîya dêmokratî ya Şengalê û r’êfêrêndpûma herêma otonom a K’urdistanê! – Ev çi ye, nak’okî ye, yan encama xwezayî ya pêvajoyên dîrokî ye?” – https://www.amidakurd.net/ku/tekst/XESERÎYA_ DÊMOKRATÎ_YA_ŞENGALÊ_Û_RÊFÊRÊNDÛMA_HERÊMA_OTONOM_A_ KURDISTANÊ ; “R’êfêrêndûm, serxwebûn û k’urd…” – https://www. amidakurd.net/ ku/tekst/R_ ÊFÊRÊNDÛM_SERXWEBÛN_Û_K_URD ; “R’êfêrêndûm pêk hat. Paşê?” – https:// www.amidakurd.net/ku/tekst/R_ÊFÊRÊNDÛM_PÊK_HAT_ PAŞÊ).

Ji xwe baş tê zanîn, ku ji r’oja pêkhatina xwe va heya îro PDK-ê hewl daye, ku hebûna xwe li ser t’unekirina hêz û t’evgerên k’urdî yên dinê misoger bike, û di vê derbarê da jî gelek agahî û belgeyê dîrokî hene, p’ir’ên wan jî hatine weşandin... Lê, her çiqas PDK lawên gelê k’urd (pêşmergeyên xwe), ên ku pêşîyên wan ji bo welatê xwe pêşmergetî kiribûne, mil bi mil bi leşkerê dagerker ên T’irkîyayê r’a li ser gêrîllayên



Di dîrokê da hert'im di derbarê dagerkerî û êrîşên t'irkan da hatye gotin, di derbarê t'evkujîyên k'urdan da – ji hêla wan va. Lê hîç kesekî carekê pirs nedaye xwe, k'a t'irk k'î ne, k'a ji At'at'ûrk girtî, heya bê-der Erdoxan, ên ku bi destê wan bêdadîya dîrokî li hember k'urdan pêk hatye, gelo hemû t'irk bûne? Gelo, yên ku îro planên t'unekirina her tiştekî k'urdî pêk tînin, t'irk in? Bala xwe bidin vê k'omê, a ku îro li ser k'arê t'unekirina k'urdan e: gurcîyek û sê kurd! Ma t'irk ev in? – Ji ç'epê, di r'êza pêşin da: T'eyîp Erdoxan û Nêç'îrvan Barzanî, li pişt wan va: Hakan Fîdan û Mesrûr Barzanî.

r'izgarîya gelê k'urd da dişîne, û bi sûcê r'êvebirya Partîyê dot û lawên gelê k'urd bi berikên birayên xwe tên kuştin û dibin gorîyên faşîzma R'êjîma Tirkîyayê û xiyaneta r'êvebirîya PDK-ê, ya ku hemû ji barzanîyan pêk tê (serokê partîyê – Barzanî, serokê herêmê – Barzanî, serokê hukumeta herêmê – Barzanî! – ma çawa dibe, dawîya gelê k'urd hatye? Ma pêşîyên wan ciwanan, ên ku îro bê xeda birayên xwe dikujin, an di şer'ê hember birayên xwe da tên kuştin, dê k'engê bigihîjin astekê û van kujerên gelê xwe r'awestînin?!). Û ev jî ne bes e, agahî tên, ku Mesrûr Barzanî bang li Erdoxan kirye, ku êrîşê bibin ser Silmanîyê!

Ma xiyanet jî ewqas dibe?!

Ma ev gel ne guneh e?

Ji xwe wisa bûye, ku heya di Behdênanê da cîh li wan teng bûye, li wira ne hemû ne, ku ji wan bawer dikin, zûtirekê dê li wira jî ji wan r'a cîh nemîne, ê, wê demê?...

Bi gotinekê, ew bi xwe bi destê xwe dîroka xwe dinivîsin!

Lê, her çi jî hebe, dilê mirov jî dêşe – bi siyaseta wan îro Başûrê K'urdistanê bûye baregeha hêzên leşkerî û sîxurî yên T'irkîya dagerker, wana Herên kirine tiştekî mîna qayneqayîtîyeke T'irkîyayê, bi xwe jî bûne xizmetkarên wê di welatê xwe da, û hemû spartin û fermanên xwe ji Ankarayê digirin...

Û, eger r'êjîmên T'irkîyayê yên berê jî wêrekî girtibûne, ku r'êberên me darizînin, heya darve jî bikin, ew ji wê bûye, ku wê demê jî di nava me da xiyanet hebûye. Lê, eger wan deman xiyanet heya r'adeyekê sergirtî bûye, ew îro vekirî, bê şerm û tirs pêk tê, û heya hewl tê dayîn, ku nivşên k'urdan ên nû jî wek xwe p'erwerde û kedî bikin.

Weha, binihêr'in, k'a ew "Rûdaw", a ku wek "berhema" hevk'arîya PDK-ê, AKP-ê û sîxurîya Tirkîyayê – MIT-ê pêk hatye, çawa bi zarê pismamekî Hakan Fîdan ê wezîrê k'arên derva yê K'T' ê bi navê Ercan Konuk di nava k'urdan da bi zaimanê k'urdî pesnê Erdoxan û siyaseta wî dide, û çawa Hakan Fîdan wek mînak dide, k'a divê mirov çawa xizmeta sîstêma kujerên gelê xwe bike... Ew bi vê bernameya t'aybet p'eyamê didin ciwanên k'urd, ku ew jî hewl bidin di pêşer'ojê da bibin Hakan Fîdanekî û xizmeta dagerker û kujerên gelê xwe bikin... Ev vîdêo 11 meh berê hatye weşandin. Di binî da 42 p'eyam û şiroveyên bînêranan hene, dema bînêran wan bixwînin, dê dilê wan baristan bibe, ku gelê k'urd serî daneynye, ew dijî, berxwe dide û têk'oşîna xwe didomîne! – Xwendevanên hêja dikarin ewê vîdêoyê li vira binihêr'in: https://www.youtube.com/watch?v=dcpc6zYrb0s , û bi t'aybetî jî p'eyam û şiroveyên bînêranan bixwînin.

Belê, dîroka gelan ne yekawa ye, di wê da berxwedan, lehengî û xiyanet di nava dijberî û dijhevîyê da ne, û gel jî di nava wan nak'okîyan da r'êya xwe dibîne, şaşî, kêmasî û têberdanên xwe dibîne, derdixe zanebûnê û li ser bingeha wan gav bi gav pêşer'oja xwe ava dike...

Gelê k'urd jî di dîroka xwe da serî li ber dagerkeran netewandye, bi berxwedan û serhildanan heya van r'ojên me xwe wek net'ew parastye, û îro jî têk'oşîna xwe didomîne... Eger em ast û naver'aoka serhildanên gelê me yên sedsala buhurî dinihêrin, dibînin, k'a têk'oşîna gelê k'urd îro gihîştye çi astê.

Şêx Seyîd berî darvekirina gotye: “Jiyana min a li vê cîhanê dawî bû. Ez ne p’oşman im, ku xwe ji bo gelê xwe feda dikim. Ew, ku di pêşer’ojê da nevîyên me dê ji bo me li ber dijmin şermî nemînin, êdî besî me ye!”

Seyîd R’iza jî ji r’ayedarên T’irkîyayê r’a gotibû: “Ez bi derew û hîleyên we nehesiyam. Ev ji bo min bû derd, min jî li ber we çok netewand, bila ev jî ji bo we bibe derd!”

Nevî û nevîç’irkê van nemiran bi van gotinên wan û bîranînên di derbarê serhildanên wan da ç’avê xwe li r’astîya gelê xwe ya dîrokî vekirine, nivş bi nivş gihîştine, û îro T’evgereke n’etewî ya gewre û bi hêz li holê ye, R’êberê net’ewî Abdullah Ocalan, her çiqas di girtîgehê daye jî, lê berhemên wî bi dehan bergan bi gelek zimanên cîhanê hatine werger’andin û weşandin, û ew bi wan berhemên xwe va r’êvebirîya T’evgera Net’ewî pêk tîne. Îro nivşeke r’ayedaran a nû gihîştye, ya kû r’êç’a R’êberê net’ewî dişopîne...

Û îro nûnerên t’evgera net’ewî baş haş ji derew û hîleyên dijimin hene, hemma ya ku li ser r’êya r’izgarîya net’ewî bûye kelem, xiyanet e. Ji ber sedemên vê xiyanetê t’evger û r’êxistinên net’ewî li ber xeterîyên mezin sekinîne. Ango, r’izgarîya net’ewî di xeterîyê da ye. Lewra jî, ji bo ku ev xeterî bê derbazkirin, an hîç nebe, bê nermkirin, divê gel bi xwe bi girseyî ji xiyanetê r’a bibêje – na! Divê xayîn, hevk’ar û xulamokên dagerker û mêtîngeran hîs bikin, ku cîyê wan û xiyaneta wan di nava gel da nîne! Wê demê gelê k’urd dê bikaribe bêhna xwe hêsa bikişîne, hemû hêz û derfetên xwe bike xizmeta r’izgarîya net’ewî û gav bi gav berbi azadîya xwe va bimeşe...

Û li ser vê notê, min dixwast di dawîyê da ji xwendevanên hêja r’a bigota, ku dot û lawên gelê k’urd ên here hêja – R’êber Abdullah Ocalan, Saleheddîn Demirt’aş, Fîgen Yûksekdax, Amed T’ûrk û gelekên dinê, yên ku jîyan û azadîya xwe ji bo pêşer’oja gelê xwe feda kirine, ne ku t’enê serbilindîya net’ewî ne, lê wisa jî misogerîya Azadîya Mezin û pêşer’ojek a r’onî ne. Ku, lewra jî gelê k’urd dê t’u carê dest ji doza xwe bernede, ewê têk’oşîna xwe ji bo azadîya xwe bidomîne û li R’êber û r’ayedarên xwe xwedî derk’eve, lewra ku hebûna wan, r’amanên wan, k’ar û têk’oşîna wana misogerîya hebûmna gelê k’urd bi xwe ye! ...

Her bi wî awahî emê bikaribin azadîya gelê xwe nêzîktir bikin!

Wekî dinê – cîhan û wijdanê xwe!

Lê em – k’urd, wek net’ew, divê zêde hêvîya xwe nedin ser wijdanê cîhaanê – eger em dixwazin di vê cîhanê da cîyekî bi r’ûmet bigirin, divê xiyanetê û xwefiroşîyê r’ed bikin (dîsa – wek net’ew!) û li dora r’amana net’ewî yekîtîya xwe ava bikin, an na, an emê winda bibin, an jî bibin dûvikê hinek ên neçê û netiştok!...

**Îvanovo/R’ûsya – 22. 05. 2024.**